



Însiyatîfa Destûrîkirin û Fermîkirina Zimanê Kurdî li Sûriyê
مبادرة دسترة و ترسيم اللغة الكردية في سوريا

Însiyatîfa Destûrîkirin û Fermîkirina Zimanê Kurdî li Sûriyeyê

Li gorî danezana destûrî, Sûriye welatekî pirneteweyî, pirçandî û pirzimanî ye. Ziman jî hêmanekî bingehîn ê nasname, çand, bîra kolektîf û veguhestina kevnetorê ya di navbera nifşan de ye. Parastina mafên zimanî ne dijberî yekîtî û serweriya dewletê û aramiya axa wê ye, lê belê hemwelatîbûna wekhev xurt dike.

Li ser bingehê prensîbên mafên mirovan ên navneteweyî, nemaze Danezana Gerdûnî ya Mafên Mirovan, her du hevpeymanên navneteweyî, Peymana Mafên Zarokan û pîvanên navneteweyî yên UNESCOyê yên der barê perwerdehiya pirzimanî û perwerdeya zimanê dayikê û ezmûnên berawirdkirî de -destpêkê jî Peymana Ewropî ya Zimanên Herêmî yan Zimanên Kêmneteweyan û Peymana UNESCOyê ya 2003yan a ji bo Parastina Kevnetora Çandî ya Ne-maddî- em tekez dikin ku parastin û veguhestina ziman di navbera nifşan de beşek ji parastina cihêrengiya çandî ye. Ji ber vê yekê, girîng e ku cihêrengiya zimanî û çandî li Sûriyeyê were naskirin û garantiyên qanûnî ji bo parastina mafên zimanî, di nav de mafê bikaranîn û perwerdehiya bi zimanê Kurdî, werin pêşxistin.

Li ser vî bingehî em damezrandina Însiyatîfa Destûrîkirin û Fermîkirina Zimanê Kurdî li Sûriyeyê radigihînin.

Ev Însiyatîfeke civakî, aştiyane û serbixwe ye; ne girêdayî ti partî yan hêlên siyasî ye. Armanca wê ew e ku bi rêbazên qanûnî, civakî, akademîk û çandî bixebite da ku mafên zimanî, çandî û perwerdehiya bi zimanê dayikê bi cih bike û ji bo cîbicîkirina wan di destûra daîmî ya Sûriyeyê û zagonên neteweyî de dabîn bike.

Armancên Însiyatîfê:

1. Destûrîkirina zimanê Kurdî li Sûriyeyê.
2. Pesendkirina statuya destûrî û qanûnî ya zimanê Kurdî.
3. Fermîkirina Zimanê Kurdî li Sûriyeyê.

Însiyatîf pabendî rêbazên aştiyane, qanûnî û civakî ye, ji wan:

1. Amadekirina lêkolînên qanûnî û destûrî.
2. Pêşkêşkirina pêşniyazan ji bo saziyên berpirsiyar ên nivîsîna destûrê.
3. Rêxistinkirina semîner, konferans û diyalogên akademîk.
4. Hevkariya bi zanîngeh, navendên lêkolînê û saziyên çandî re.
5. Hevkariya bi rêxistinên navneteweyî yên pîspûr ên di warê perwerde, çand û mafên mirovan de.
6. Amadekirina pêşnûme û pêşniyazên zagonî yên têkildarî mafên zimanî.
7. Hişyarkirina civakê di warê girîngiya cihêrengiya zimanî û çandî de.
8. Belgekirina rewşa rastîn a perwerdehiyê û mafên zimanî û pêşkêşkirina lêkolîn û raporên di vê derbarê de.

Daxwazên Însiyatîfê:

1. Avakirina dewleteke hemwelatîbûnê ya pirçandî û pirzimanî.
2. Avakirina modeleke destûrî ku cihêrengiya zimanî û çandî nas bike (ji ber ku ev yek parçeyek ji rastiya civakî ya Sûriyeyê ye) û garantiyên qanûnî yên zelal bide neqşandin, bîyî ku dest bide yekbûna axa Sûriyeyê û serweriya wê.

Her wiha ev Însiyatîf bang li Rêxistina Perwerde, Zanist û Çandê ya Neteweyên Yekbûyî (UNESCO), Rêxistina Zarokan a Neteweyên Yekbûyî (UNICEF) û hemû saziyên din ên navneteweyî yên têkildar dike ku:

- Piştgiriya lêkolînên têkildarî perwerdehiya pirzimanî li Sûriyeyê bikin.
- Piştgiriya parastina kevnetora çandî û zimanî bikin.
- Piştevanîya diyalogê ya derbarê modelên navneteweyî yên herî baş ên ji bo parastina cihêrengiya zimanî bikin.

Di dawiyê de û li gorî vîzyona ku ji hêla vê Însiyatîfê ve hatiye pejirandin, em Sûriyeyê wek dewleteke wekheviyê û xwedî hemwelatîbûn dibînin ku yekbûna ax û serweriya xwe, her wiha cihêrengiya çandî, neteweyî û zimanî ya civaka xwe diparêze.

Ji ber vê yekê, destûrîkirina zimanê Kurdî ne ji bo betalkirina mafên kesên din tê xwestin, lê belê wek beşek ji avakirina pergaleke destûrî ya nûjen e ku mafên hemû sûriyan mîna hev diparêze.

Wekheviya zimanî tiştekî ji kesî kêmtir nake û cihêrengiya çandî ne gefek e li ser yekîtiya dewletê; lê belê rêxistina wê ya destûrî û qanûnî yek ji bingeheke guncaw e ku dewleteke xwedî hemwelatî û serweriya qanûnê ava bibe.

Qamişlo, 17 Cotmeha 2026'an

Însiyatîfa Destûrîkirin û Fermîkirina Zimanê Kurdî li Sûriyeyê